# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (250):

## Hurhutandina merivên Pakrewanên Newroza Cindirêsê, topebarankirina Nexweşxana "Tilrif'etê", jiyana hin girtiyan di metirsiyê de ye, revandina endamine Da'işê bi riyên qaçax, dizîn û vêrgeyin
















Têveliya warên jiyana Kurdan li Sûriyê di bîrdoziyên Rijîma Turkiyê de yaxmekirî ne, ta ku sivîl bin jî; Di navboriya salên hikumdariya Erdoxan de -bi taybetî di dehsala dawiyê de- bal kişande ser nasname û çanda Toranî ya Turkî û hêzkirina hestên "bîriya buhêreka Osmanî" û tekezî li ser kir, li ser hesabê nasname û berjewendiyên gelên din; Wê dijberiya xwe ji hebûna Kurdan û beşdarbûna wan re şidand, û ew bi cîbicîkirina binpêkirin û tewanên têvel û bi cûrbecûr alav û şêweyan di dermafê wan de hate wergerandin.

**Ev jî hin bûyîn pêkhatiyên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= "Dadgehkirina" tewankarên Pakrewanên Newroza Cindirêsê:**

Piştî ku tiştên li paş û hûrgiliyên **komkujiya şeva Newroza Cindirêsê** /20/ê Avdara 2023an. Z (ya ku tê de **çar şehîdên** bira bûne qurban) açiq bûn, û sê kujer hatin girtin, û ew doz bû dozeke gelêrî û siyasî û mafwerî, dîsa jî hewildanên dorpêçkirin û bincilkirina wê hene, nemaze ku Destlatên Dagîrkeriyê di pêngavên dadgehkirinê de lingan bi ber hev dixin û xwe hêgle dikin, wan dadgehkirin bo Bajaroka "Çobanbegê/El'ra'î" (ya ku dora /75/KM ji Efrînê dûr ) - Herêma "Babê" guhestin, û berî wê jî kujer bo hepsa wê hatibûn guhestin, bi ser hebûna "**Dadgeha Cînayata**" li  Bajarên Efrînê û Ezazê (ya hevcîwar jê re); Û zehmetiyek mezin ji şopandina dozê re heye, û piştî sê heyvan ji çêbûna tewanê rûniştina yekê ya dadgehkirinê hate lidarxistin; Û di perçevîdyoke ku li 20.6.2023an. Z hatiye belavkirin de, hevjîna pakrewanekî li ser hurhutandin û tengasiyên ku merivên pakrewanan û birayê wan (ê tek û tenê mayî) tûşê bûne - çi di rûniştinê de û çi jî li ser riya vegera  Efrînê li cem rêbendên Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî"-  dipeyive.

Bi bîr were jî Destlatên Dagîrkeriya Turkiyê yan "Hikometa Hemahengiyê ya Demkî" -weke rêzgirtin ji hestên merivên pakrewanan û xelkê Cindirêsê re- tu pêngav -ta ku rûcesneyî bin jî- di dermafê Milîseyên

"Artêşa/Ceyş El'şerqiyê de" (yên ku kujer ji wan in û berpirsiyar in di ber wê deverê de) navêtine, wekî ku wan ji Cindirêsê derxin an biryargehên wan ên li wir bigririn an jî wan bidin ber berpirsiyariya ewlehiyê ji ber bûyer di çarçewa bandoriya wan de pêk hatiye!

**= Topebarankirina "Tilrif'etê":**

Li 16.6.2023an. Z, Artêşa Turkiyê nexweşxana Bajaroka "**Tilrif'etê**" (ya bi Koçberên Efrînê mişt) topebaran kir, di pêvajoya harbûna wê ya leşkerî ya dawiyê de û armanckirina wê ji hejmarek cîgehên leşkerî û sivîl re (yên di bin desteserkirina Artêşa Sûriyê de) - gundewarê Bakurê Heleb, û di encamê de ziyanin şênberî çêbûn û çar sivîl -di nav de kadroyeke bijîşkiyê- cûrbecûr birîndar bûn, û ew jî ev in: (**Muxlês Ehmed Ne'isan** /25/sal ji Gundê "Çeqmaqê Mezin" - Navça Reco, **Ebdela Ebid El'rehman Mûrad** /40/sal ji Bajaroka "Kefirsefrê" - Navça Cindirêsê, **Mihemed Hemîd** /45/sal ji Gundê "Uga" - Navça Bilbilê, **Dermankar Mistefa Hesen** /27/sal ji Gundê Gewrikê Jêrin - Navça Mabeta), û yê dawiyê ji ber rewşa wî ya metirsîdar bo nexweşxaneyeke Heleb hate guhestin.

**= Girtinine bêsûcane:**

**-** Hîna Hemwelatî "**Elî Xelîl Xelîl** /45/sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" - N. Cindirêsê li ba Milîseyên "Feyleq El'şam" di Hepsa G."Îska" - Şêrewa ya taybet de ji Gulana 2020an ve zorane bendkirî ye, û ew ji ber nexweşiyê û wendakirina tibabeke pir ji giraniya xwe digaze, bê zanîna tuhmetên xwe yan jî bi kêmanî dadgekirina wî bi rengekî wêneyî li ba dadgehên ku Destlatên Dagîrkeriyê li Efrînê çêkirine, bi ser ku têkeliya wî bi rêveberiya berê re tunebû.

**-** Girtî "**Hesen Şukrî Seydo** /39/sal" ji xelkê G."Îska" - Şêrewa di Hepsa "Maratê" de li Efrînê ji ber nexweşiyên gurçikê û dil (ên ku jiyana wî dikin metirsiyê) dinale; Û ew li ba Milîseyên "Feyleq El'şam" di Hepsa "Îska" ya taybet de (li navêna 16.11.2018an. Z ta destpêka Reşmeha 2022an. Z) zorane bendkirî ma, ta ku bo "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" û paşê jî bo Hepsa "Maratê" bi raporeke bi kîn (e li ser bingeha tuhmetên çêkirî) hate şandin, û bi /5/sal hepis hate cezakirin; Herweha "dadgehê" li ser (çarêka demê) ji cezakirina wî jî erê nekir, ta ku li Tebaxa 2022an. Z bihata berdan; Û piştî bavê wî yê temenmezin seredana wî di hepsê de kir, ji ber qehir û xemgîniya li ser, xwîn di mejî de cemidî, û kete rewşeke xerab.

**-** Hemwelatî "**Nebo Elo kurê Elî** /25/sal" ji xelkê G. "Îska" - Şêrewa, li navîna Cotmeha 2018an. Z -sê heyvan- ji aliyê Milîseyên "Feyleq El'şam" ve hate girtin, û di dû re ji nû ve li Mijdara 2020an. Z hate girtin, û bi tuhmetên çêkirî (yên ku di bin işkencê de jê hatine kişandin) bo Hepsa "Maratê" hate şandin, û bi sê sal hepis hate dadgehkirin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

**-** Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" yên ku "**Ehmed Îhsan Feyad El'hayês ê ku bi Ebû Hatêm Şeqra** tê navdan" serkêşiya wan dike, û yên ku piraniya endaman ji Parêzgeha "Dêrezorê" ne, û bi têkeliyên xwe (yên mekin digel bermayên Rêxistina "Da'işê") û hewandin û revandina endamên wê bi qaçaxî naskirî ne, û "**Ebû Ce'ifer**" yek ji Kadroyên "El'şerqiyê" û berê jî ji "Artêşa/Ceyş El'îslam" li "Xota Şamê" û yê dest daniye ser maleke Malbata "Omo" li Bajaroka "Reco" û tê de rûniştî, û bi hevkariya serkêşine ji "El'şerqiyê" û nivîsgeha wê ya aboriyê, endamine **"Da'işê"** di sînorê sînordar bi herdu Navçên "Reco û Bilbilê" yên hevcîwar re bo Turkiyê dide revandin; Û piştî nelihvkirinekê di navêna wî û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Bilbilê" de li ser parvekirina pereyên revandinê, asayêşê ji heftakê ve ew girtiye, û niha li Navenda "Bilbilê" bi tuhmeta qaçaxiyê seknadî ye.

**-** Li 17.6.2023an. Z, piştî ku xortine anîndeyan ji Êla "El'igêdat" Xort "**Ehmed Reşîd Kelebçek** /17/sal" ji xelkê Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa hurhutandin û gefgur danê, dogişek di nav herdu aliyan de çêbû û "Ehmed" kêr bi kar anî; Û giropeke ji mêrên êlê êriş mala wî kir û lêda û qurşîn bi jor ve avêtin û rewşke ji tirsê peyda bû; Û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" "Ehmed" û hejmarek ji merivên wî girtin, û piştî lihevanînekê di nav herdu aliyan de, li roja din berdan.

**-** Li 21.6.2023an. Z, çekdarina **keblê xizmetguzariya Enternêtê** (yê di navêna herdu Gundên "Turindê û Endarê" de - Başûrê Efrînê û enternêtê dide Gundên "Kurzêlê, Endarê, Basûtê, Bircebdalo, Xezîwê" û hine din) dizîn.

**= Binpêkirinine din:**

**-** Ji dora heyvekê ve, serokê "Şaxa Asayêşa Leşkerî li Reco" vêrgiyek li ser hejmarek bazirganên Bajaroka Reco yên Kurd (hezar Dolar Emrîkî li ser her yekî) ferz kir, bi behaneya avakirina odeyine nû ji hepsa şaxê re.

**-** Ji dora heyvekê ve, Milîseyên "Artêşa/Ceyş El'şerqiyê" Hemwelatî "**Mihemed Mistefa Îbiş**, **Ristem Henîf Oso**, **Nîdal Mistefa Oso, Idrîs Mehemed Ne'isan**" ji xelkê Gundê "Xalta" - N. Cindirêsê çend katan revandin û mekin li wan xistin, bi behaneya pişikdariya wan di mêtîngên piştgiriyê bi xwediyên pakrewanên Newroza Cindirêsê re (yên ku bi qurşînên endamên wan şehîd ketine).

**-** Li şeva 20.6.2023an. Z, çekdarin ji Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" mala Hemwelatî "**Hesen Tosin**" li Gundê "Eşûnê" - Navça Bilbilê basmîş kir, jê tibabeke diravî û hejmarek ji tenekên zêtê zeytûna û cereyek gazê û tiştine din dizîn, piştî çûndina herdu hevjînan bo Efrînê ji bo dermankirinê, û xewkirina cîranê wan ê temenmezin "**Ehmed Bekir**" di hewşa malê de, yê ku tûşî devgirêdanê û lêxistinê û bendkirinê di odak malê de bûye.

Herweha wan milîseyan ji dora du heyvan ve, timiştên mala Hemwelatî "**Elî Şe'ibo**" li heman gundî serbinqotî hev kirin û dizîn, ê ku neçar bûye bireve û zorane koçber bibe, ji ber fişarên ku ji aliyê Destlatên Dagîrkeriyê û milîseyan ve li dijê hatinê kirin; Ew bi tena xwe rûniştibû piştî ku berê malbata wî penaber bûbû.

**-** Li Şeva Pêncşemê 22.6.2023an. Z, Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" (yên ku orta "Reco" destser dikin) /50/ teneke zêtê zeytûna (her yek/16/ KG sade) yên Hemwelatî "**Emîr Hisên Elî**" ji xelkê Gundê "Hecxelîl" yê hevcîwar dizîn, ji orta kolana serekîn - bazara bajarokê, bi ser virvûtên Destlatên Dagîrkeriyê de (yên ku dibêjin giropên gerok ên çavdêrîkirina şevayî hene).

**-** Li Bajaroka **"Mabeta"**, Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" -serkêş û piraniya endamên wan ji Turkmana- azar dan dora /50/ malbatî ji anîndeyên Parêzgeha "Hemê" (yên berê alîgirên Milîseyên "Ehrar El'şam"), da ku ta roja rawestana/weqfa "Cejna Qurbanê" li 27.6.2023an. Z mal û dîkanên dest danîne ser vala bikin û ji bajarokê derkevin, ji bo ew û yên jê ve nêzîk dest dînin ser wan malmewdanan.

Herweha jî ew li ser her kesekî ji nişteciyên resen (ê ku vegeriye cîwarê xwe) **/100/Dolar** Emrîkî vêrgî ferz dikin, ta ku rê bidinê li wir rûne û kertê kesyetî/nasname derîne, û **/500/Dolar** jî li ser radestkirina her malekê ji xwediyê wê re, û bi riya navbênciyekî; Û di deh rojên dawiyê de /5/malbat vegerîne Bajaroka "Mabeta".

**- Dizîna werzên**/mûsimên meywan li Gundên "Turindê, Kurzêlê, Endarê, Basûtê, Bircebdalo, Xezîwê, Şadêrê û Îska" - Başûrê Efrînê ji aliyê çekdaran û yên jê nêzîk ve ji anîndeyan, di çarçeweke fere de tê kirin, bê ku xwediyên wan wêribin qedexe bikin an giliyekî li dijî dizan vekin, ji ber gefên li xelkê wan gundan berdewam tê kirin.

**-** Ta niha **çêrandina bêwijdan** û hovane ji keriyên pez û dewarê anîndeyina ji Êla "El'mewalî" li herdu Gundên "Tilifê û Keferzîtê" - Efrîn di nav zeviyên zeytûna de berdewam e, û li ber çavên serkêşên milîseyan û Istîxbaratên Turkiyê, da ku ziyaneke mezin bigihêje daran û berhemên wan, bê ku xwediyên wan wêribin rêgirekê ji çêrandinê re dînin an jî giliyekî li dijî yên dikin vekin, ji ber ku şivanên pêz û dewêr û perwerdekarên wan bi çek in û xwe bi milîseyan mekin dikin û xelkê gef dikin.

Hewildanên dorpêçkirin û bincilkirina doza komkujiyeke di dermafê mirovahiyê de hatiye pêkhatin, armanckirina sivîlina û nexweşxaneyekê (weke cîgeheke tenduristiyê) û koma binpêkirin û tewananan, berdewamiya siyasetine dijayetiyê (yen riswakirî yen ku Hikometa Anqerê - Erdoxan bi awakî rêkûpêkirî/rêbazkirí bi kar tîne) ne.

25.06.2023 an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Topebarankirina nexweşxana Bajaroka "Tilrif'etê", 16.6.2023an. Z**.**

- Girtî "Elî Xelîl Xelîl".
- Girtî "Hesen Şukrî Seydo".
- Yê bi "Ebû Ce'ifer" tê navdan - yek ji kadroyên Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê".
- Dîkana "Emîr Hisên Elî" li Bajaroka Reco.